Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1094 | 27-Tebax- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

## Befrîn bi tabloyên xwe dengê jinan radigihîne

**Jina ciwan a bi navê Befrîn Îbrahîm, bi xêzkirina tabloyan bûye deng û rengê êşa jinên Kurd. Befrîn bi firçeya xwe ya wêneyan êş û zehmetiyên jinan radigihîne.**



Jina ciwan a bi navê Befrîn Îbrahîm xelkê Rojhilatê Kurdistanê ye. Hîn ji zarokatiya xwe de heskirina wê ji çêkirina wêne û tabloyan re hebû. Li gor ew dibêje, bi reng û tabloyan mirov dikare peyama xwe bigihîne. Ji ber wê Befrîn hewil dide bi rêya xêzkirina tabloyan peyamên cûda bigihîne civakê.

Befrînê ji temenek biçûk de dest bi çêkirina wêneyan kiriye û heta niha jî berdewam dike. Befrîn ev sê salin li gel hevjînê xwe ji Rojhilatê Kurdistanê hatine Başûr û li Silêmaniyê niştecih bûne. Befrîn li Silêmaniyê karê xwe dike û tevlî pêşangehan dibe.

Befrîn Îbrahîm diyarkir ku her çiqasî li Rojhilata Navîn sîstema baviksalarî li pêş pêşketina jinan bûye asteng û azadiyên jinan zeft kiriye, lê malbata wê hertim jêre bûye alîkar. Befrîn got; "Malbata min hertim bi min re bûne alîkar, niha jî ez zewicîme û hevjînê min alîkariya min dike."

Befrîn eşkere kir ku heta niha nêzî 500 tabloyan çêkiriye û bi rêya tabloyan kariye peyama rastiya bûyerên civakê bigihîne cîhanê. Befrîn got: "Êş û astengiyên ku di nav civakê de li pêş jinan hene, ji bo min bû îlham daku ez dest bi çêkirina tabloyan bikim. Bûn sedem ku ez di xêzkirina tabloyan de berdewam bim û bixwazim bi rêya tabloyan peyama jinên êşkişandî ragihînim. Ez dixwazim bi tabloyan bibim beşek ji şoreşa ku li dijî sîstema zilamsalarî hatiye destpêkirin."

Di dewamê de Befrîn Îbrahîm da zanîn ku beşek ji jinan ketine xefika sîstema sermayedariyê û wiha dom kir:"Her çiqas di berê de jinan ji ber kevneşopiyan nedikarin kar bikin û parastinê li mafên xwe bikin, lê niha ta radeyek azadî ji bo jinan çêbûye û jin tevlî karan dibin. Lê hinek jin ketine xefika sîstema sermayedariyê û jêhatina xwe piştguh xistiye. Hemû bala xwe dane ser ciwankarî (estetîk) û tiştên xeyalî. Bi rêya neştergeriyên ciwankariyê bedena xwe wek amûran lêkirine. Lê divê hemû jin kar ji bo mafên jinan kar bikin."

Befrîn Îbrahîm diyarkir heta niha tevlî şeş pêşangehên li Rojhilatê Kurdistanê bûye. Befrîn got"Ez plan dikim li gel hin hevalên xwe yên din ku ew jî xelkê Rojhilatê Kurdistanê ne û li Silêmaniyê niştecihin, li Silêmaniyê jî pêşangehên şêwekarî vekin."

## Pirtûka 'Dîroka Rojnamegeriya Helebce' hat nasandin

**Bi merasîmekê danasîna pirtûka 'Dîroka Rojnamegeriya Helebce' ku ji aliyê rojnameger Nizar Kerîmî ve hat nivîsandin, hat kirin.**



Li Helebceyê Sendîkayên Rojnamegerên Kurdistanê û Navenda Geşepêdana çalakiya Welat, li baxçeyê Navenda Geşepêdan çalakiya welat merasîmek ji bo danasîn û bexşîna pirtûka Dîroka Rojnamegeriya Helepce' ku ji aliyê rojnameger Nizar Kerîmî ve hat nivîsandin, hat kirin.

Pirtûk ji aliyê nivîskar û rewşenbîr Necmedîn Gûryan ve hat nasandin, piştre beşdaran nêrînên xwe anîn ziman.

**'Rojnamegerî û dîrokek kevin li vî bajarî heye'**

Nivîskarê pirtûkê Nizar Kerîm wiha got:"Ev pirtûk derbarê dîroka rojnamegerî û lêkolînên li ser rojnamegeriya Kurd dîtin, bihîstiye û xwendinê de li Helebce ji sala 1953'an heta Gulana sala 2023'an li 82 dezgehên rojnamegriyê hebûn, ji derveyî nûnertiya kanalan niha tenê 14 dezgeh berdewam dike. Armanca me bi belavkirina vê pirtûkê ew e ku dîroka rojnamegeriya kevin heye destpêkê avakirina rojnamegerî li vî bajarî hebû, me dikarîbû dîroka vî bajarî tomar bikin."

## 'Şopa Orkîd` dîwarên bajarê xwe rengîn dikin'

**Bi dehan ciwan însiyatîfek bi navê "Şopa Orkîd" destpê kirin û di çarçoveya wê de bi xêzkirina wêneyên li ser dîwaran, kolanên bajarê xwe xweşik dikin.**




Ji Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê 12 şêwekar û hezkiriyên şêwekariyê yên destpêkir, beriya 3 mehan komeke bi navê "Şopa Orkîd" ava kirine û bi derfetên xwe yên xweser dê li ser dîwarên kolanên hin taxên bajêr wêneyan xêz bikin. Heta niha tu aliyek xwedî li însiyatîfa vê komê derneketiye, ew bi xwe boyaxê û madeyên pêwîst dikirin.

Ev huner, yek ji hunerên herî kevin e ku bi hebûna mirovê seretayî re wekî zimanekî dîtbarî hebûye, ji nivîsên li ser dîwarên şikeftan dest pê dike û dûre wêneyên li ser gipsê li Yewnanistana kevnar dihatin xêzkirin û li sûkên giştî dihatin danîn.

Ev huner gelek girîng e, nemaze ku dîroka şaristaniya Firewn a kevnar de bi rêbaza herî guncew bi hezaran salan parast. Bi pêşketina civakan re, ev huner wek xebatên xirakirinê navandin. Lê gelek akademisyenên hunerî, destnîşan dikin ku ev huner gelek girîng e ji ber ku şêwazeke naskirî ya vegotinê û rêya danûstandina bi civakê re ye.

Bi dîtina xebatên li kolanên Qamişloyê pêk hatine, dê temaşevan wêneyên xeyalên zarokan bibîne. Ruxmî ku gelek mijar hene dikarin bi rêya vê hunerê balê bikişînin ser. Mîna hişyarkirina şêniyan ji bo pêşgirtina li îsrafa avê.

Têkildarî mijarê wênesaz Samir Kalo diyar kir ku ew ji pejirandina vê hunerê dixwazin li gel 13 salên alozî û şer geşbiniyê di nav zarokan de belav bikin û kolanên xwe xweşik bikin.

Koma "Şopa Orkîd" plan dike ku heke piştgiriya pêwîst bi dest bixe, însiyatîfa xwe firehtir bike ku heta niha 3 qonaxên wê hene. Yek jê li Girkê Legê û yên din li Qamişloyê ne.

Endamên komê dibêjin ew amade ne, li ser tevahî dîwarên kolanên bajêr wêneyên çandî û hişyarkirinê xêz bikin û hêviyê belav bikin.

Însiyatîf, ne ya yekemîn e lê belê beriya wê jî bi teşwîqkirina Desteya Çand û Hunerê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hebûn ku ruxsetên pêwîst ji wan re pêşkêş kirin.

Sudoku: Bersiv 4

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 6 | 8 | 1 | 2 | 9 | 5 | 7 | 3 |
| 5 | 1 | 2 | 7 | 6 | 3 | 4 | 8 | 9 |
| 3 | 7 | 9 | 8 | 4 | 5 | 6 | 1 | 2 |
| 1 | 3 | 4 | 2 | 5 | 7 | 8 | 9 | 6 |
| 6 | 8 | 7 | 4 | 9 | 1 | 3 | 2 | 5 |
| 2 | 9 | 5 | 6 | 3 | 8 | 7 | 4 | 1 |
| 8 | 4 | 3 | 5 | 1 | 2 | 9 | 6 | 7 |
| 9 | 2 | 6 | 3 | 7 | 4 | 1 | 5 | 8 |
| 7 | 5 | 1 | 9 | 8 | 6 | 2 | 3 | 4 |

Sudoku:Pirs 5

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 1 | 8 | | | | | 5 | |
| 7 | | 6 | 8 | 5 | 1 | | | |
| 4 | 5 | 3 | | | | | | |
| 5 | | | | 2 | | | | 4 |
| | | | 5 | 3 | 4 | | | |
| 6 | | | | 9 | | | | 1 |
| | | | | | | 7 | 5 | 3 |
| | | | 2 | 6 | 7 | 9 | | 8 |
| 1 | | | | | | 2 | 4 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Reşke dilê xwedî xweşke:**
- Baş nehatiye çêkirin; seresere hatiye çêkirin; ji stûyê xwe kiriye.

**Ser guhê xwe re avêt:**
Jidil çênekir; baş çênekir.

**Serxiştî bindevî kir:**
- Baş nekir; seresere kir.

**Sê ji sê re got, ew jî zîvirî ji dora xwe re got:**
Bi heman wateyê.

**Siûda gur di qûna şivanê pîs de ye:**
Kesên dilê wan xirab ji kesên sist û xemsar sûdê digirin.

**Siwariya kerê şermek e payabûn du şerm in:**
Dema mirov rahişt karekî, yan dest bi gotinekê tiştekê kir divê di nîvî de nehêle.

**Şov reş kir dilê xwedî xweş kir:**
- Seresere kir; ne bi dilê xwe kir; ji stûyê xwe kir.

**Wisa kirin wisa xwarin:**
- Karê xwe seresere kirin

**Xweşmêran mêr dikuştin, qelsemêran ûr û rûvî dişûştin:**
- Em bi çi ve mijûl in ew bi çi ve mijûl e; em li ser tiştên pir girîng diaxivin, ew behsa tiştên -beredayî dike; rojeve me diguherîne.

**LI SER KESÊ BIXWE ZERERÊ DIDE XWE**

**Bi destê xwe mala xwe xirab kir:**
- Xwebixwe zerer da xwe.

**Bi nanê xwe lîst:**
Bi destê xwe karê xwe xirab kir; xeşîmî kir; tiştên şaş kirin.

**Bi teriya xwe dilîze:**
- Bixwe serê xwe dixe belayê.

**Bi xwe de aniye:**
Wî bixwe bi xwe kiriye.

**Bi xwe kiro, bi xwe re kiro:**
- Ew bixwe bûye sedema tişta hatî serê wî.

**Bi xwe lîst/leyist:**
-Bixwe karê xwe xirab kir.

**Bi zimanê xwe leyist/lîst:**
- Gotinên ne di cih de gotin; xwe bixwe giliyê xwe kir.

**Deriyê xwe mor kir:**
Tiştek li cem xwe nehişt; xwe xusirand; mala xwe bi destê xwe xirab kir.

**Deriyê xwe kilîl kir:**
Bi heman wateyê.

**Gora xwe bi destê xwe kola:**
- Bi destê xwe zerer da xwe; wî bixwe zerer da xwe.

**Ji destê wî hat serê wî:**
- Wî bixwe zerer da xwe.

**Ji garanê hemûyê li dora makera xwe zîvirî:**
- Bi heman wateyê.

**Ji nava garanê çû li dora kerê xwe ket:**
- Geriya ku zererê bide dijberê xwe, lê di dawiyê de zerer da xwe.

**Kevir li çoka xwe xist:**
Bê ku ferq bike, bi kiryar, yan gotinên xwe zerer da xwe.

## Li ser şopa Jin, Jiyan, Azadî



Kongreya Navneteweyî ya Tecrûbeyên Tevgerên Jinan a bi dirûşma "Li ser şopa Jin, Jiyan, Azadî" bi encamnameyekê bi dawî bû. Di encamnameyê de gelek biryar hatin girtin. Ji wan biryaran mîsaqeke jinan a herêmî ya hevbeş were avakirin, ji bo xurtkirina têkoşîna hevbeş a jinan kongreyeke herêmî were lidarxistin, herwiha ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan pêngavên stratejîk werin avêtin.**R-2**

Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1094 | 27-Tebax- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# DAGIRKERIYA TIRK JI HÊZA ÇAPEMENIYA AZAD A JINAN DITIRSE

Dewleta Tirk a dagirker 23'yê vê mehê bi balafira bêmirov êrişî erebeyeke rojnamevanên JIN TV'yê kir û di encamê de ajokarê erebeyê şehîd bû û rojnamevanek birîndar bû. Êrişên li ser rojnamevanan dide xuyakirin ku heyanî çi astê dagirkeriya Tirk ji çapemeniya azad ditirse û naxwaze ku rastî derkevin ronahiyê.**R-3**




## 'Çareserî tenê bi danûstendinên Sûrî –Sûrî pêkan e'



Hevseroka MSD'ê Emîna Umer diyar kir ku çareseriya kirîza Sûriyê tenê bi diyalog û çareseriya siyasî pêkane û got, hikumeta Şamê bêhelwest û bêbiryare, yên ku wê bi rêve dibin jî Rûsiya û Îranê ye.**R-4**

## PDK'ê ji dijmin re bûye amûra qirkirina gelê Kurd




PDK'ê û ENKS'ê ji bo rewakirina dagirkiriya li Efrînê çi ji destê wan tê ji dagirkeriyê re dikin û ji bo qirkirina gelê kurd ji dijmin re bûne amûr. Berpirsê Ofîsa Têkiliyan ya Meclisa Sûriye Demokratîk Mihemed Hesen diyar kir ku PDK'ê bi riya Saziyên xwe yên li Efrînê li dijî gelê kurd hevkariya dagirkeriyê dike.**R-5**

## 'Divê siyaseta dijmin di Efrînê de were teşhîrkirin'

Li herêma Şehbayê ji aliyê Rêveberiya Xweser ya herêmê ve kampaniya ziyaretên gelê Efrînê hat destpêkirin. Hevserokê kantona Efrîn û Şehbayê Melek Hisên diyar kir ku di van demên dawiyê de dagirkerî siyaseta teşwîqkirina vegera Efrînê dide meşandin û got "armanca me ew e ku gel nekeve xefka siyasetên dijmin".**R-6**



## 'Hunera wênesaziyê rêhevala jiyana min e'



Wênesaza ciwan Solîn Osê diyar kir ku wê bi xwestek û hezkirineke pir mezin dest bi xêzkirina wêneyan kir û got, wênesazî cîhana mirov ya hundir e, ez bi evîndariyekê mezin bi xêzkirina wêneyan ve hatime girêdan û roj bi roj hiskirina min ji wênesaziyê re zêde dibe.**R-7**



**H.Fidan, çima çû Bexda û Erbîlê?**
Ahmed Aktaş R-4

# Li ser şopa Jin, Jiyan, Azadî

Kongreya Navneteweyî ya Tecrûbeyên Tevgerên Jinan a bi dirûşma “Li ser şopa Jin, Jiyan, Azadî” bi encamnameyekê bi dawî bû. Di encamnameyê de gelek biryar hatin girtin. Ji wan biryaran mîsaqeke jinan a herêmî ya hevbeş were avakirin, ji bo xurtkirina têkoşîna hevbeş a jinan kongreyeke herêmî were lidarxistin, her wiha ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan pêngavên stratejîk werin avêtin.

**Ronaz Silêman/ Qamişlo**

Di 18 û 19’ê Tebaxê de zêdetirî 100 jinên ji Lubnan, Filistîn, Sûriye, Iraq, Misir, Tunis, Urdin, Yemen, Sûdan, Tirkiye û Îranê ne li paytexta Lubnan Beyrûtê civiyan û (Kongreya Jinan a Tecrûbeyên Tevgerên Jinan ên derketina ji aloziyên li herêmê ) li dar xistin. Kongre bi dirûşma “Li ser şopa Jin, Jiyan, Azadî” hat lidarxistin. Derbarê kongireyê de ku li Libnanê hat lidarxistin endama Cîgira civaka demokratîk a kongira Star Rûken Ehmed ji rojnameya me re axifî.



Rûken Ehmed diyar kir ku bi 100`an jin ji 11` welatin Ereban cihê xwe di kongirê de girtin û wiha got: “ Jinên ji Lubnan, Filistîn, Sûriya, Îraq, Misir, Tûnis, Urdin, Yemen, Sûdan, Tirkiyê û Îran di kongirê de amedebûn, herwiha kungire babetên heyî li ser 30 rûniştinan gotûbêjkir. Rûniştina yekem li ser mijarên Raperîna ku di 2011`an de ji Tûnisê destpêkir, bi navkirina buhara Ereban çima ew buhar bû payiz û sedemê wê çibûn, ev raperîn encamên xwe bi cih nekirin, şoreş bû ne şoreş bû. Tevger û tekoşînên ku hatine çêkirin, guherînên di sîstem û civakê de dane çêkirin, bi taybet bandora dagirkeriyê li ser jinên kurdistanê di vê sedsala dawî de çibûne.

Sîstema hikûmeta îranê ya ku li îranê tê çêkirin îro jinên îranê di bin çi bandorekê û rewşeke giran de derbas dikin. Di heman demê de jî rewşa jinên efrîqiya bi giştî çiye sedemên sîstemê heyî ev mijar berfireh hatin nîqaş kirin û giftûguhên gelekî zengîn û bi nirx hatin kirin. Rûniştina 2`an de jî herî zêde weke sîstema hevserokatî li bakurê kurdistanê hatin şîrovekirin. Sîstema şoreşa jinê li bakur û rojhilatê sûriyê, sîstema xweseriyê ji sîstem û rêbazên ku jin didine meşandin, herwiha tevlîbûna jinê di hemû qadên jiyanê de.”

**‘Şoreşa Rojava pêwîste bibe malê hemû jinan’**

Rûken Ehmed wiha girîngî da axaftina xwe di roja yekemîn de hûm guftuguh bi awayekî baş hatin kirin û wiha got:” Bi tevlîbûna hemû jinên beşdarvan nîqaş hatin kirin, herwiha li ser ezmûnên sîstema hevserokatî, şoreşa Rojava ji milê ku çawa destkeftiyên şoreşê bikin malê giştî jinaan. Tekoşîn bi çi rêxistinbûyînê karîbû li ber xwe bide û heta çi astê xwe berfireh bike. Nîqaşên berfireh derbarê jinên Şingalê ku gelek ji wan hîn aqîbeta wan nayê zanîn û wendane. Çeteyên DAIŞ`ê li holê metirsiyeke li ser tevahî cîhanê. Li hemberî vê yekê rewşa tekoşîna jinên Şengalê beramberî 74 fermanên ku hatiye kirin, Îro roj sîstema xwe ya parastinê bi çi rengî daye avakirin. Herweha raperîna Rojhilatê kurdistanê ya bi duruşmeya “jin jiyana azadî” destpêkir, raperîna




bi şoreşa keziyan hatiye naskirin. “

**‘Piştgirê azadiya jinan Rêber Apo ye’**

Rûken Ehmed diyar kir ku di roja duyemî de jî li ser Rêber Apo hevalê piştgirê felsefeya azadiya jinê ye û wiha got: “ Rêber Apo her tim piştgiriya jinan dike û felsefeya azadiya jinê pêşxist. Bi mafên jinan bawer kir û ji bo ku rewşeke baştir û pêşerojeke xweştir ji jinan re ava bibe, kar û xebat kir. Ji milê qanûnî ve parêzer Rengîn derbarê rewşa Rêber Apo de nirxandinên berfireh kirin û destnîşan kir ku CPT hevkarê hemû kiryarên derhiqûqî yên ku li hemberî Rêbertî têne meşandin.

Herweha Rengîn da xuyakirin ku pêwîste li hemberî tecrîdê gel her tim di nava tevgerê de be û ji bona vê yekê, hem ji milê qanûnî, siyasî û ramyarî de hemû nêzîkatiyên bê hiqûqî yên ku li hemberî Rêber Apo têne meşandin werin teşîrkirin û doza Rêbertî bibe dozeke cîhanî. Herwiha di rûniştina ji aliyê Berdevka Insiyatîfa ji bo azadiya Rêbertî li Rojhilata Navîn û Bakurî Efrîqiya ji aliyê Sewsen Şoman ve hatiye pêşkêşkirin de got: Geleke ku gel û jinên azadîxwa çi bikin, nimûneyê wê jî ku kampaniya insiyatîfa beriya salekê destpêkiriye, were berfireh kirin û pêwîste ku jin xwedî lêderkeve. “

**‘Bi encamnameyekî kongire bi encam bû’**

Rûken Ehmed axaftina xwe wiha qedand: “Bi encamnameyêkê ev komxebat bi dawî bû. Encamname jî li ser piştgiriya jinên Ezîdî Efxanistan û hwd...bi gîştî jinên di asta herêmê de yên ku rastî êrîşan tên xwedîderketineke li wan were kirin. Herwiha sûd wergirtin ji ezmûnên hev, bi taybet jî ezmûna jinên kurd û sîstema hevserokatî were naskirin û şîrovekirin. Em karibin bi wesîleya vê kongirê mijarên hevbeş yên jinan ji milê xweparastina li beramberî hişmendiya desthilatdar ve. Ya din jî em weke hevpeymaneke jin di asta herêmî de bidin çêkirin, têgînên jinan ji nû ve were dest girtin û em ji van têgînan sûdê bigirin. Herwiha weke kampaniya ji aliyê qomîteyên hiqûqî ve werin destpêkirin. Ji bo daxwazên azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, em xebatek ji bo aşîtiyê û demokrasiyê bidine meşandin.”

# Jîna Emînî çirûska azadiyê

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

**Piştî qetilkirina jina ciwan Jîna Emînî ji aliyê rêjîma Îranê ve, serhildana JIN JIYAN AZADÎ bi pêşengiya jinan li Rojhilatê Kurdistanê dest pê kir û li tevahiya Îranê belav bû. Bi nêzîkbûna salvegera yekem ya serhildanê berxwedana jinan berdewam e.**

Bûyera kuştina Jîna Emînî di 16’ê Îlona 2022’an de, di asta îranê û navneteweyî de bû sedema dengvedanê, ku polîsên exlaqî ji ber negirtina desmalê bi awayekî rast ew kuştin û îfadeyên hin jinên ku gel wê hatibûn binçavkirin,piştrastkirin ku Emînî piştî ku li hember heqaretê li ber xwe da ye restî lêdan û îşkenceyên ji aliyê endamên polîsên exlaqî ve hatiye. Heman jêderan tekez bi wê yekê jî kirin ku ew tûşî kirîza dil û mêjî bûye û nûçeya mirina wê di rewşên nepenî de ragihand, piştî du rojan ji girtina wê.

Derbarê salvegera yekem ya serhildana JIN JIYAN AZADÎ mamoste û xwendekarên Zanîngeha Rojava ji rojnameya me re axivîn.

**Jin Jiyan Azadî**

Li Rojhilatê kurdistanê di bin silogana jin jiyan azadî de li ziqaqan gel, jin, mêr,xwendekar û ciwan bi giştî di bin vê silûganê de bûn destek û li hemberî desthilatdariyê derketin, vê serhildanê bingeha xwe ji mirina jineke bi navê Jîna Emînî ya ku li ser destê desthilatdariyê hat kuştin ji ber ku tayek ji porê wê ji derveyî desmala wê derket bû, di derbarê vê yekê de xwendekara Zanîngeha Rojava Kînda kinan axivî û wiha got: “Em dikarin bêjin ku kuştina jinan ji kevnar de heye, ji ber ku hîn di dema berê de jî bûyerekî weke vê hebû jê re nêçîra pîr ebokan digotin, jinên zane û yên kêrhatî gava birîn derman dikirin ev nav lê dikirin û yekser ew dikuştin, ev tê wateya ku zihniyeta bavik salariyê li dijî zihniyeta çanda dayîkê derdiket û herdem zilam dixwest bêhtir zihniyeta xwe li pêş bixe û xwe bibîne pêşengê civakê.”

**‘Jîna Emînî bû çirûska azadiya jinan’**

Kînda axaftina xwe wiha berdewam kir: “Ev serhildana ku li Rojhilatê Kurdistanê çêbû, bi giştî jin, ciwan, mêr hemû di vê serhildanê de bûn yek, ev serhildan ji bo me ciwan wek mûmekî bû û Jîna Emînî wek riyekî li pêşiya me vekir ku keçeke hewqasî bi cesaret bû li hember desthilatdariyê sekinî, ev yek bû çirûskek li pêşiya ciwanên kurd, ev serhildan bi awayekî bê sînor hat belavkirin dengê wê li giştî cîhanê belav bû. Raste vê serhidanê salek li dû xwe hişt lê em dikarin bêjin ku di vê salê de gelek têkoşîn hat kirin li hemberî deshilatdariya îranê, piraniya kesê ku derdiket kolana û silogana jin jiyan azadî digotin xwendekar bûn, ji ber vê yekê piraniya wan ji zanîngehê dûrketin û rêjîmê gelek zirar gihand wan.”


**Meyada Ebdî**


**Kînda Kinan**

Xwendekara Zanîngeha Rojava Kînda Kinan dawî li axaftina xwe anî û wiha got: “Em wek jinên ciwan dikarin destek bidin vê yekê, gava em tekoşînekî di hundirê xwe de xurt bikin, yan ku em wek jin bikaribin asta xwe ya zanistî û şoreşgerî li pêşbixin, da ku di sberojê de deng û banga xwe bighînin giştî cîhanê.”

**Tundiya ku Li Ser Jîna Emînî hat kirin**

Jîna Emînî rastî tundiyeke gelek dijwar hat û endamê rêjîma Îranê bi awayekî hovane lêdan, bi vê hovîtiyê jiyana xwe ji dest da, Mamosteya Zanîngeha Rojava ya bi navê Meyada Ebdî derbarê serhildanê de wiha got: “Qetilkirina Jîna Emînî bû sedema nerazîbûnê di nava gel de, li tevahiya cîhanê dirûşmeya Jin Jiyan Azadî serhildan rabû, ew jî wek bangewaziyekê bû ji bo serhildana jinan, ji ber pergala bavik salariyê jî ya ku li hember jinan ku wan diçewisîne û tudiyên ecîb tîne serê jinê. Piştî ku gel rabû ser piya û banga azdiya jinê kirin û ev kiryara ku hat kirin li dijî wê derketin, ew azadiya ku di hundirê jinê de bi hezarê Sala hatibû çewisandin, her kes li dijî wê derket û li dijî rêjîma Îranê ya ku bingeha xwe li ser tunekirina jinan avakiribû û nedkarî pergala demiqratiyetê ava bikê, ev kiryar rihê jinan hişyar kir û dest bi qutkirin û şewitandina porê xwe kirin wek rengekî ji ne razîbûnê dan xuyanî kirin li tevahî cîhanê. Ev serhildan bû gavek mezin ji bo jinan, herwiha dengê jinan netenê li Rojhilatê Kurdistanê bilind bû, li her derî dan xuyanî kirin ku jin rastî tundiyê û kuştinê tên.”

**Kuştina jinan di bin navê namûsê de**

Meyada Ebdî da xuyanî kirin ku rojana jin di bin navê namûsê de tê kuştin, di sîstema baviksalariyê de gava jin û mêr bikevin şaşîtiyan kes nikare li hember zilam tiştekî bike lê jin tê ceza kirin û tunekirin, nabe ku jin bê deng bimînin û xwe ker û lal nekin, ji bo kiriyarên wisa divê dengê xwe bighînin tevahî cîhanê.

Mamosteya Zanîngeha Rojava Meyada Ebdî dawî li axaftina xwe anî û wiha got: “Banga min ji bo cihên rêxistinê yê ku girêdayî mafê jinê ne, divê piştgiriya jinê bike û yekîtiyeke xurt were avakirin da ku jin ji vê zor û zilmê xilas bibe û hêviya min ewe ku bi çavekî mirovî li jinê meyze bikin û heger îro em ji bo mirina Jîna Emînî bêdng bimînin siba wê bi hezaran jin bê sûc were kuştin û rêxistin ji bo van kiriyara were kirin da ku nemîne kelem di pêşiya jinê de.”



# ‘Hunera wênesaziyê rêhevala jiyana min e’

Wênesaza ciwan Solîn Osê diyar kir ku wê bi xwestek û hezkirineke pir mezin dest bi xêzkirina wêneyan kir û got, wênesazî cîhana mirov ya hundir e, ez bi evîndariyekê mezin bi xêzkirina wêneyan ve hatime girêdan û roj bi roj hiskirina min ji wênesaziyê re zêde dibe

**Ronahî Silêman/Qamişlo**

Hunera Wênesazî, xwedî dîrokekê pir dirêj û kevnare. Cara yekem wêne di civaka xwezayî de li ser dîwarên Şikeftan û Cermên lawiran hatiye dîtin. Mirovan bi xêzkirina wêneyan jiyana xwe, derdor, bûyer , çand û serdema ku tê de jiyan kirine derxistiye holê. Lewra yek ji berhemên ku di nav civakê û cîhanê de belavbûyî ne hunera wênesaziyê ye.

Yek ji wênesazên jin yên Rojavayê Kurdistanê ku wênesazî hunera xeyal û xewnên wê yên zarokatiyê ye, Solîn Osê ji rojnameya me re axivî û got, min li gorî xeyalê xwe hunera xwe li pêş xistiye û ez bi riya hunerê hest û ramanên xwe derdixim holê.

**‘Armanca pêşketinê kir armanca xwe’**

Solîn Osê diyar kir wê ji zarokatî ve dest bi xêzkirina wêneyan kiriye û wiha got: “Her mirovek ji zarokatiya xwe ve jêhatîyeke wî heye, li cem min jî jêhatiya xêzkirinê hebû. Tiştê ku min di pêşiya xwede didît, min xêz dikir, roj bi roj hizkirina min ji wênesaziyê re zêdetir dibû, lê malbat û civaka me piştgirî nedan jêhatiya min. Ji ber ku çivakê tu girîngî ne dida wênesaziyê , ev yek pir bandora wê li min hebû, hêrseke li cem min çêbû ku çima civak û malbat vê yekê ji min re dibêjin, di vir de min pêşketin kir armanca xwe ya sereke û hunera bedew xwend . Min ji ber kêmderfetan xwendina xwe temam nekir, lê piştî damezrandina Zanîngeha Rojava min hunera bedew tê de xwend û xwena xwe pêk anî. Niha jî ez endama Yekîtiya hunermend û rewşenbîran im û kar û xebatê wênesaziyê dikim. “

**‘Bi xwendin û şêwekariyê ez pêş ketim’**

Solîn Osê di berdewamiya axaftina wiha got: “Destpêka ku min dest bi wênesaziyê kir, tenê yekem kesê ku piştgiriya min kir mamosteyê minî yê refa7`an, Mûstefa Xelîl bû, ji min re got, heviya min heye ku di siberojê tê bibe şêwekareke mezin, ji ber di wêneyên min de jêhatî û hizkirina min ji xêzkirinê re dît, di wê demê de min bîra şêwekariyê nedibir, tenê min digot wêne bi rengan tê xêzkirin. Lê dema min asta xwe li pêş xist û dest bi tabloyan kir, herwiha di pêşengehan de amede bûm, wê demê malbat û civakê piştgiriyan min kirin. Ji ber dema ku min tabilo çêkirin û ketim warê şêwekariyê de, derdora min naskirin ku jihatiyeke li ba min heye, her kes nêzî min bû û alîkarî di aliyê şinberî û razberî de kirin. EZ jî BI xwendinê û şêwekariyê gihştim vê astê. “

**‘Ez bi riya wênesaziyên hestên xwe vedibêjim’**




Solîn Osê derbarê hunerê hestên xwe wiha anî ziman û wiha got: “Şêwekarî ji bo min wek hevalekî ye , ez bi riya xêzkirina wêneyan hestên xwe parve dikim, bi taybet rewşa derdora min gelek bandora wê li ser kar û xebatê min heye, destpêkê bandora penaberiyê li min kir, di tabloyek de li ser xêz kir, piştire li ser azadiya jinê, vê yekê hestek xurt da min ku dikarim gelek karên xweş bikim, lê piştgiriyeke aborî ji min re divê, alavên me tineye di vir de zehmetiyan dikişînin. Herwiha derbarê kar û xebatê min de, ez di gelek pêşengehan de beşdar bûme, yekem pêşingeh ku min wêneyên xwe lê pêşkêş kir li Zanîngeha Rojava bû, piştire li Navenda Mihemed şêxo, di Pêşengehên Salane de, Sempoziyom, herwiha bi riya onlayin, Pêşengehên navnetewî û heta niha min 52`tablo çêkirine, hemû pêşketinên ku ez gihaştimê bi saya şoreşa Rojava bû. “

Wênesaz Solîn Osê axaftina xwe wiha qedand: “Şêwekarî zanîneke li cem her mirovekî tine ye. Ji bo wê hêviya min ji tevahî civakê re ku şêwekarî wek her beş û cureyên di cîhanê de ye, gelek girînge ji ber dema çanda çav xurt dibe, çanda gel jî li pêş dixe.”

# Dagirkerî nekarî xeyalên wê asteng bike

Baryana 16 salî li Şehbayê di nava komên Hîlala Zêrîn de li keman, gîtar û defê dide û hêviya wê ew e, ku xwe bi rengekî hîn baştir pêş bêxe û bigêje armanca xwe.

Piştî ku dewleta Tirk û hêzên çete yên pê re Efrîn di Adara 2018´an dagir kirin, Baryana Sîdo jî tevî malbata xwe koçî Şehbayê bû. Niha ew li kampa Serdemê ya Şehbayê dimîne, û li gorî şert û mercên koçberî û zehmetiyên herêmê li pey xeyalên xwe yên muzîkjeniyê diçe.



Baryana Sîdo ji gundê Çolaqa yê ser bi navçeya Cindirêsê ya Efrîna dagirkirî ye. Piştî dagirkeriyê ji neçarî tevî malbata xwe koçber bûye û niha li kampa Serdem a Şehbayê ye. Baryana Sîdo niha 16 salî ye. Ji zarokatiya xwe ve li pey xeyalên xwe yên muzîkjeniyê ye da ku rojekê bibe hunermendeke navdar. Lê dewleta Tirk a dagirker bi êrişên xwe li ser herêma Efrînê bû bend li ber xeyalên Baryanayê. Piştî ku xelkê Efrînê yê Kurd bi darê zorê hatin koçberkirin 18’ê Adara sala 2018’an, Baryana Sîdo li Şehbayê bi cih dibe da ku bi xelkê xwe re berxwedana li dijî dagirkeriyê dewam bike û bi serbilindî vegere Efrînê.

**Malbata Beryana pêre alîkar bû**

Baryana Sîdo li ser destpêka gavên xwe yên muzîkjeniyê dibêje, ji ber ku ew di nava hunermenên muzîkî de mezin dibe, ew jî hez ji muzîkê dike: “Ji ber ku di nav malbateke hunermend de dijîm; bav, xwişk û birayê min stranbêj û muzîkjen in, min hez ji huner û muzîkê kir. Ji ber ku biçûk bûm û diçûm dibistanê, min nekarî zêde bi pêş ve biçim. Lê piştî koçberiya me li Şehbayê, min cihê xwe di koma zarokan de girt û di wir de min stran gotin û hez ji gîtarê kir.’’

**Baryana xwe hînê lêdana Gîtarê dike**

Baryana di dewama axaftina xwe de got, “Dema min hez ji Gîtarê kir, derfeta min a ez hînê lêdana wê bibim tune bû. Lê ji ber ku xwişka min muzîkjen û mamosteya kemanê ye û li Şehbayê dersên kemanê dide, ez jî hînê lêdana kemanê bûm. Kesê hînê lêdana kemanê bibe, dikare hînê lêdana her amûra bi têl bibe. Min Gîtarek ji xwe re peyda kir û bi rêya kursên înternetê, min xwe hînê lêdana gîtarê kir. Bi israra xwe, min zincîrên zehmetiyên koçberiyê qetandin û hêdî-hêdî zêdetir hînê lêdana keman û Gîtarê dibim.’’

**Dixwaze bibe hostekara Gîtarê**

Baryana Sîdo dibêje, bi rêya perwerdekirina xwe bi xwe û bi alîkariya malbata xwe, di nava Saziya Çanda Jinên Hîlala Zêrîn a Kantona Efrînê û Şehbayê de ew bûye endameke sereke û axaftina xwe bi van gotinan qedand: “Niha ez li Şehbayê di nava komên Hîlala Zêrîn de li keman, Gîtar û defetê didim û hêviya min ew e, ku xwe hîn zêdetir pêş ve bibim û bigihîjim armanca xwe.”

Baryana Sîdo îsal tevî endamên koma Mîra Huseyin Zeno û Şiyar Amanosê, strana hunermendê nemir Aram Tîgran “Zînê” bi awayekî serkeftî gotibû û di ber re jî li Gîtarê dabû. Ev performansa wê li ser hesabên medyaya dijîtal a Awazên Kurdî hatiye belavkirin.

# Komxebata jinên ciwan

Dîwana Wêjeyê, komxebateke wêjeyî ji bo jinên ciwan daye destpêkirin. 11 jinên ciwan ên Kurd û Ereb di komxebatê de cihê xwe digirin û hînî nivîskariyê dibin.

Her sal, Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ‘Hefteya Hunerî’ li dar dixe. Di hefteya hunerî ya 2022`yan de ji aliyê nivîskarên hazir ve biryara pêkanîna ‘Komxebata Geşkirina Behremendiya Wêjeyî ya Jinên Ciwan’ hatibû dayîn.

Îsal jî di 15`ê Tîrmehê de komxebatê bi tevlêbûna 11 jinên ji pêkhateyên Kurd û Ereb ên ji herêma Cizîrê dest pê kir. Hefteyê 2 caran jinên ciwan li Qamişloyê kom dibin û ji aliyê mamosteyên pirspor ve fêrî huner û şêwazên nivîsê dibin.

Berdevka Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Narîman Evdikê da zanîn ku ew ji bo piştgiriya jinên ciwan ên dixwazin derbasî qada nivîsê bibin, vê komxebatê li dar dixin û got, “Ders bi Kurdî û Erebî ne, me xwest şert û mercên nivîsê bi zelalî bi wan re parve bikin.”

Li gel Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nivîs û pirtûkên jinan bi awayekî cuda tên nirxandin. Narîman Evdikê der barê wê de got, “Ji ber hestên jinan ên nazik, pênûsa wan jî cuda ye; herî zêde jî ev di wêjeyê de diyar dibe.”



# ‘Divê siyaseta dijmin di Efrînê de were teşhîrkirin’

Li herêma Şehbayê ji aliyê Rêveberiya Xweser ya herêmê ve kampaniya ziyaretên gelê Efrînê hat destpêkirin. Hevserokê kantona Efrîn û Şehbayê Melek Hisên diyar kir ku di van demên dawiyê de dagirkerî siyaseta teşwîqkirina vegera Efrînê dide meşandin û got “armanca me ew e ku gel nekeve xefka siyasetên dijmin”.

**Zana Roj/ Şehba**

Di 16 Tebaxê de, Rêveberiya Xweser li herêma Şehbayê dest bi kampaniya ziyareta malbatên Efrînê yên li Şehbayê kir. Di çarçûveya van ziyaretan de nirxandinên rewşa dawiyê, guhdarkirina helwest û gazinên malbatan, herwiha ya sereke hişyariya gel ji siyaseta dijmin ya ku li ser gelê koçber dide meşandine, hatin niqaşkirin. Dagirkerî siyaseta teşwîqkirina vegerandina gelê Efrînê dike. Piropagendeya ku di Efrînê de weke ku tiştek tuneye û jiyan aram e dide meşandin. Bi kişandina gel ji herêmê re dixwaze dagirkeriya xwe li herêmê rewa bike. Ji ber van diyardeyan rêveberiya herêmê li Şehbayê dest bi hemleyekê giştî ya ziyaretan li ser asta herêmê daye destpêkirin û wê heyanî 15 rojan bidome.

Girêdayî kampaniya û armanca sereke ji van ziyaretan hevserokê kantona Efrîn û Şehba Melek Hisên ji rojnameya me re axivî.

**‘Divê siyaseta dagirkeriyê di Efrînê de were teşhîrkirin’**



Melek di destpêkê de anî ziman ku dagirkerî polîtîkeyên zirav dide meşandin, ji bo ku gelê Efrînê vegerîne û wiha got: “Di hundir Efrînê de tavahî cureyên kiryar û binpêkirinan tên meşandin, tevî van polîtîkayên qirêj yên dagirkeriyê jî, armanca faşîzma Tirkiyê ew e ku gelê Efrînê yê koçber vegerîne Efrîne û hebûna xwe rewa bike. Bi taybet di van demên dawiyê de, PDK’ê bi vekirina saziyên xwe di Efrînê de polîtîkeya teşwîqkirina gel ji bo vegerin Efrînê û di bin siya dagirkeriyê de jiyan bikin tê meşandin û bûye rojeveke sereke. Rastiya dagirkeriyê dixwazin bi riya vegerandina malbatan bi xapandinê bidin rewa kirin, ji lewra divê ev siyaset were teşhîrkirin.”

**‘Li ser Rêveberiya Xweser û gelê Efrînê pilanên qirêj tên dayîn’**

Melek diyar ku di civîna Astanayê ya dawî de, li dijî gelê Efrîn yê li Şehbayê û Rêveberiya Xweser, di navbera aliyên, civînê de pilanên qirêj hatin dayîn û wiha domand: “Di civînên dawiyê yên di navbera Tirkiye, Sûriyê, Rûs û Îran de ku li Astanayê hat çêkirin, gelek pilanên qirêj li dijî Rêveberiya Xweser di herêmê de hatin nîqaşkirin. Bi armanca valakirina herêma Şehbayê, her wiha vegerandina gelê Efrînê ji bo rewakirina dagirkeriya Tirkiyê di Efrînê de ev pilangerî hat erêkirin û dest bi piropaganda û êrîşan bû.”

**‘Heyanî Efrîn ji dagirkeriyê neyê paqijkirin, wê vegera wê ne pêkan be’**

Melek di axaftina xwe de anî ziman ku armanca me ji van ziyaretan ku gel nekeve xefka pilanên dijmin û wiha got: “Di vê mehê de me dest bi vê kampaniyê kir û wê 15 rojan berdewam bike. Ev kampanî wê li ser asta herêmê bê berdewamkirin ku em bikaribin derbasî tavahî malbatên me bibin. Bê guman armanca me ye sereke ew e ku em siyaseta dijim ya ku bi rê û rêbazên zirav dide meşandin teşhîr bikin da ku gelê me nekeve xefka siyaseta dijim. Di hundir van ziyaretan de em dibînin ku gelê me bi heyecanekê



me pêşwazî dike, di heman demê de nerazîbûna xwe li hemberî van siyasetan didin nîşandan û tekez dikin ku heyanî Efrîn ji dagirkeriyê neyê paqij kirin wê veger wê ne pêkan be”.

**‘Misogerkirina vegera Efrînê bi têkbirina dagirkeriyê re ye’**

Hevserokê kantona Efrîn û Şehba Melek Hisên axaftina xwe wiha qedand: “Em ê venegirin Efrînê heyanî em dagirkeriyê tune dikin. Divê tavahî gelê me di wê baweriyê de be ku heyanî dagirkerî di Efrînê de hilneweşe em venagerin. Ji ber wê yekê jî têkoşîn û berxwedaniya pîroz ya ku tê meşandin ji bo hilweşandina dagirkeriyê û misogerkirina vegerke bi rûmet û serbilind e”.

# Rola akademiyan di perwerdeya civakî de

**Volqan Elî**

Akademî yan jî ‘Akademiya’ wekî gotin di dîrokê de cara destpêkê di Yewnana antîk (kevnare) de hatiye bikaranîn. Ji beriya mîladê 500-600 di Yewnana wê rojê de serdema ku fîlozofên wekî Sokrates jiyan dikir, êdî civak ber bi pûçbûnê ve diçû. Ji aliyê exlaqî, çînî ve rizîneke ber bi çav dihate jiyankirin. Ruxmî ku di nava jiyana civakî de bi her aliyê lêkolîn û hewldan jî hebûn, derûdor û kesên xwediyê derfet her tişt ji bo menfeata xwe dikir, difikirî. Mînak, di astekê de felsefe û zanistên xwezayî jî bi pêş ketibûn. Lê gelek alim û fîlozofên di van mijaran de serwer in (wekî Protogoras), digotin ew dikarin vê zanist û hunera xwe di pêşberê pereyan de bifiroşin. Ji aliyê din ve fîlozofên serkêşiya wan Sokrates dikir, digot “hewce dike ti alim û mamoste zanist û hunera xwe bi pereyan nefiroşe. Yanê nebêje, ez xwediyê zanist im, kî hewceyê zanist û hunerê be bila were. Ji min zanist, ji wan pere. Divê kes zanista xwe nefiroşe!”. Sokrates tenê wisa nedifikirî, ev jiyanî jî dikir. Li gorî wî çiya û banî, bax û bexçeyên Atîna tev fêrgeh bûn. Xelk û alem li xwe kom dikir, bêyî berjewendî hewl dida hunera xwe veguhezîne wan.

Xêrnexwazin Sokrates dîtin ku rewş cidî ye, civak û ciwan li dora wî dibe xelek. Axir jê re çareyek peyda kirin. Gotin, “Sokrates bi aqlê ciwanên me dilîze, wan ji rê derdixe”. Ew derdest kirin, xistin zindanê û mehkûmî mirinê kirin. Di dema wî de fêrgehên Sokrates, bi navê Akademî nedihatin nasîn. Piştî mirina wî, xwendevanê wî Platon li ser rêbaza wî di dîrokê de cara yekem Akademî ava kirin û perwerde da.

Heta em dikarin dîroka ‘Akademiyan’ pir paşde jî bibin. Bi rastî jî wekî sosyolog jî dibêjin, klan malzaroka hemû sazî û dezgehên civakî ye. Mînak, bigire ji malbata îro yan jî rexistinên civakî, exlaq û hwd. Ji temsîla xwe ya destpêke di nava klanê de dibînin. Klan, şiklê civakê yê destpêkê ye. Di maneyekê de civaka destpêkê çawa ava bûye, rêgezên wê yên esasî çi bûne îro jî heman rêgez derbas dibin. Exlaq, komînalîzm û kolektîfîzm…, jiyana bi hev re û şirîk…. Çawa ku klan ji hemû tiştê bi civakê re eleqadar re malovanî kiriye, di heman demê de ‘Akademiya Civakî’ ya destpêkê ye jî. Piştî sedhezaran sal jî, di nava herîkîna dîrokî de bigir ji ‘Akademiyayên Sokrates heya bi akademiyên roja me ya




îro ma ne maneya wan heman tişt e: Avakirina hişmendî û zêhniyeta civakî, avakirina civaka nû.

Ev diyardeyên civakî (klan-gund û heta qebîle û eşîr) bi perwerdeya civakê jî radibûn, ji bo ji nû ve afirandina civakê wekî dibistan û fêrgehan bûn. Lê wekî gotin, dîrok li benda Sokrates bû. Ji ber ku me li jorî behsa wê kiribû em wekî peyv, wekî naveroka behsa Akademiyên Sokrates û Eflatûn nakin. Dîsa jî ji bo fêrgehên (akademiya) civakî, mirov dikare tenê tiştekî bîne ziman ji serdemên paleolîtîk (serdemên kevirê kevn), ji wê demê heya bi roja me ya îro ev fêrgehên civakî (klan bi xwe) bi rol û risteke hevbeş rabûne: Birêxistina hişmendiya civaka demên pêş.

Serok Apo balê dikişîne li ser paqijbûna hedef û amûrê. Dibêje ku ‘paqijbûna armanc û hedefê têrê nake, lazim e amûrên ku mirov bi wan xwe bigihîne armancê jî paqij bin’. Em çima hewce dibînin vê bêjin. Di roja me ya îro de Bakûr û Rojhilatê Sûriye, bi Rêveberiya Xweser tê birêvebirin; civaka demokratîk (civak exlaqî û polîtîk) di qonaxa xwe ya meşa bi çarlepikî de ye. Hebûnek, zindiyek û pergalek ku hê nû nû ava dibe, xwe ava dike di maneyekê de di qonaxa xwe ya herî zeyif de ye. Ji ber vê yekê ji her tesîra derve re vekiriye, pergala wê ya parastinê ji nerehetî û ji nexweşiyan re tam ne amade ye. Sîstemên wê pêk tînin hê kamil nebûne, ne temam in. Tam jî di vê maneyê de mînak pergala me ya perwerdeyê, nikare-nabe ku amûr (li şûna Akademiyan zanko) yan jî rêbazeke (mînak, di perwerdeyê de lêdan) pergala qabtalîzim zêde bide pêş.

Dîsa, di hişmendî û zêhniyeta ku pergala qaptalîzimê de mejiyê mirovan de ava kiriye de zanist-perwerde, li pereyan an jî li desthilatdariyê hatiye girêdayin. Eger beşeke zanist-perwerdeyê di astekê de dûrî pere û destilatdariyê be zêde qiymeta wê jî tine. Ji bo vê mînakek herî baş; zîreat û çandinî yek ji qadên herî zêde bi jiyanê re eleqadar e. Lê mixabin ji ber ku xwendekarên wê beşê xelas dikin zêde kar peyda nakin, hema bêje li piraniya welatan dibistanên wisa pir hatine bê qîmetkirin.

Eger em weke civaka demokratîk amûra perwerdeyê wekî pergala resmalî û zêhniyeta wê, tenê bi armanca bûne xwediyê pîşe ( yanî pere) bi kar bînin, em di dawiya dawî de ne di nava civakeke demokratîk de, lê di nava sîstema qaptalîzim a milkparêz de xwe bibînin. Yanî pratîka zankoyan ku naverok û şiklê wan li gorî pergala qaptalîzim, li gorî hişmendî û zêhniyeta egoîst hatiye dîzaynkirin, li me dizivire; doxtor, endezyar û mamosteyên tendirustî, ekolojî û perwerdeya civakî ne xema wan e û bi pey pereyan ketine mezin dibin.

Eltarnatîfa vê çi ye? Divê em li ruhê destpêkê yê ‘Akademiya’ vegerin.



# Tirkiyê ji hêza çapemeniya azad a jinan ditirse

Dewleta Tirk a dagirker 23’yê vê mehê bi balafira bêmirov êrişî erebeyeke rojnamevanên JIN TV’yê kir û di encamê de ajokarê erebeyê şehîd bû û rojnamevanek birîndar bû. Êrişên li ser rojnamevanan dide xuyakirin ku heyanî çi astê dagirkeriya Tirk ji çapemeniya azad ditirse û naxwaze ku rastî derkevin ronahiyê.

**Navenda nûçeyan**

Di serî de tê zanîn ku dagirkeriya Tirk êrişî sivîl û rojnamevanan dike û armanca wê ew e, ku vîna civakê bişkîne û rojnemevanên şopa rastiyê bê deng bike. Weke ku em dizanin di dîrokê de li ser axa Kurdistanê û gelê kurd êrişên qirkirin û pişaftinê têne meşandin û heyanî roja îro jî ev siyaset dewam dike. Dewleta Tirk dixwaze bi vê rêyê gelê kurd ji nav bibe. Her kesê ku kurd be û wek welatparêz bixebite, Tirkiye hewl dide ku wî ji nav bibe. Cudahiyê naxe navbera tu tiştî, ji bona xwe her tiştî mubah dibîne. Li ser civak û gelê kurd qirkirinê dide meşandin û xwezaya Kurdistanê jî talan û qir dike. Dagirkeriya Tirk hebûna xwe li ser tinekirina gelê kurd ava dike û dixwaze gelê kurd ji holê rake. Di serî de pêşengên civakê û hemû kesên ku bi rengekî çalak kar û xebatê didine meşandin ji bona dagirkeriya Tirk armancin û di destpêka van de jî xebatkarên rojnamegeriya kurdî tên.

**Bi êrişan wê nikaribin vîna me bişkînin**

Di serî de tirsekî mezin ê dewleta tirk li hemberî fikir û remanê ku Rêber Apo di nava civakê de çandiye heye. Dagirkeriya Tirk ji fikir û remanê azadiyê yê ku pêşengtiya wê jin di her qadê de dide meşandin ditirse û bi her rengî dixwaze vê yekê asteng bike. Armanca êrişa li ser xebatkarên JIN TV’yê jî her ew e ku rojnamevanan çavtirsandî bike, lê belê em ê heman xebat û têkoşînê bidomînin. Êrîşa dewleta Tirk a dagirker a li ser rojnamevanan wê yekê nîşanî me dide ku dewleta Tirk ji hêza jinan ditirse, bi taybetî jî ji hêza jinên rojnamevan. Ji ber ku jin hemû rastiyan eşkere dikin. Lê bile dagirkeriya Tirk bizanibe ku wê êriş nikaribin me bitirsînin, berevajî wê yekê ev êriş wisa dikin ku em xebata xwe cidîtir û baştir pêk bînin.

**Êrîşa li ser rojnamevanan hemû zagonên navnetewî binpê dike**

Weke ku tê zanîn armancgirtina jinan bi temamî li dijî hemû qanûnên navneteweyî û mirovî ye. Rojnamevanên azad dengê heqîqetê ne û armanca dewleta Tirk ji êrişên bi vî rengî jî ew e ku vî dengê azad bêdeng bike û wisa bike ku rastî negihîjin gel. Lê di vî warî de hemû saziyên navnetewî jî hevkarê dagirkeriya Tirkiyê ne û çavê xwe ji kiryarên dagirkeriyê yên li ser gel û rojnamevanan digre.

Dagirkeriya Tirk di êrişên xwe de tu pîvan û sînoran nasnake û dixwaze ku Kurdistanê bike dojeh ji bona ku Kurd nikaribin têde bijîn. Li Bakurê Kurdistanê hemû pêşengên civakê û rojnemevan avêtine zindanan û rojane wan binçav dike û êrişî navendên wan dike. Herweha girtiyên ku di zindanê de ne wan bernade û gelek girtî di zindanê de şehîd ketin û nehatin berdan.



Hovîtiyeke bê sînor li ser gel û civakê tê meşandin. Li Başur jî bi hevkariya PDK’ê heman tişt li ser rojnamevanan tê meşandin, herwiha PDK’ê jî rojnemevanan digre û qetil dike û çarenûsa gelek rojnemavanan nayê zanîn.

Rojnamevanên azad ku rastiya sûcên hovane yên DAIŞ’ê û dewleta Tirk ya dagirker ji raya giştî re eşkere dikin, ji bo wê tên hedefgirtin, tên bombebarankirin û eger pêşiya van êrişan neyê girtin wê hemû civak bibe qurbanê van êrişan.

23’yê Tebaxê balafireke bêmirov û biçek ya dewleta Tirk ya dagirker li ser rêya Qamişlo-Amûdê wesayîta tîma JIN TV bombebaran kir. Di êrişê de karmendê kanala JIN TV Necmedîn Feysel şehîd bû û nûçegihana JIN TV Delîla Egîd bi giranî birîndar bû.

Têkildarî hedefgirtina rojnamevanên Çapemeniya Azad ji aliyê balafirên bêmirov û biçek yên dewleta Tirk ya dagirker ve, rojnamevanên jin ên Başurê Kurdistanê diyar kirin ku qetilkirina rojnamevanan li ser asta netewî û li gorî zagonên navnetewî yên mafên rojnamevaniyê sûcekê dermirovî û hovane ye, herwiha binpêkirina mafên rojnamevaniyê ye û gotin, mixabin me dît û em dibînîn ku rojnamevanên azad hatin hedefgirtin û qetilkirin û wisa diyar dibe ku rêze qetilkirinên rojnamevanan wê pêk were.

Ji ber ku rojnamevanan û medyayê di eşkerekirina sûcên dewleta Tirk û DAIŞ’ê de roleke mezin û dîrokî leyîst; “Bandora rojnamevan û medyayê li ser raya giştî hebû. Tirkiye çiqas ji hebûna statûya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, ji QSD, YPG û YPJ’ê ditirse, ew qas jî ji Çapemeniya Azad û rojnamevanên azad ditirse ku bi tevayî girêdayî nirx û keda şehîdan e. Çapemeniya Azad amadeye ku canê xwe bide ji bona ku rastî di tariyê de nemînin û sûcên dewleta Tirk ji raya giştî ya cîhanê û civaka navnetewî re eşkere bike.”

**Pêwîste ku her kes dengê xwe li hemberî van êrişan bilind bike**

Tişta ku niha ji aliyê dewleta Tirk ya dagirker ve tê kirin, berdewamiya siyaset û şerê qirkirin û tunekirina dîrok, çand, bîr û hebûna gelê Kurd e. Niha dewleta faşîst ya Tirk di çarçoveya şerê taybet û qirkirinê de, bi êrişên xwe yên bênavber û bêsînor rasterast li dijî tevayî gelê Kurd şerekî giştî daye destpêkirin. Herweha hedef girtina rojnamevanan aliyekî din yê van êrişên hovane yên dewleta Tirk a dagirkere û ya ku tu sînorên mirovî, exlaqî û navnetewî nasnake, bi taybet jî dagirker rojnamevanên Çapemeniya Azad ku li ser şopa heqîqetê û veguhestina dengê rastiyê ne têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd, dike hedef. Ji ber vê yekê pêwîste di asta navnetewî, navxweyî û herêmî de helwesteke cidî li dijî van êrişên qirker û hovane yên dewleta Tirk a qirker û faşîst bên nişandan. Ji ber ku dagirkeriya Tirk a qirker cesaretê ji bêdengiya navnetewî digre û ew jî bi bêdengiya xwe dibin hevkarê van sûcên dij mirovî yên ku têne kirin.

# Êzidî vedigerin warê xwe

**292 Êzidiyên li kampên Duhokê diman, bi dilê xwe vegeriyan Şengalê. Wezareta Koçberiyê û Koçberan a Iraqê got ku ji bo Êzidî vegerin wê bixebite.**

Wezîra Koç û Koçberan a Iraqê Îvan Fayeq ragihand ku 292 koçberên din yên Êzidî bi dilê xwe ji kampên Duhokê vegeriyane Şengalê.

Wezîra Koç û Koçberan ya Iraqê Îvan Fayeq di daxuyaniyekê de ragihand ku 292 koçberên din yên Êzidî bi dilê xwe ji kampên koçberan ên li Duhokê vegeriyane ser cih û warên xwe Şengalê.

Di daxuyaniya Wezîra Koç û Koçberan ku bi destên Rojnews’ê ketiye de 292 koçberên Êzidî bi dilê xwe ji kampên koçberan yên li Duhokê vegeriyane ser cih û warê xwe Şengalê. Herwiha Wezîrê ferman



daye ku hemû aliyên peywendîdar ku hêsankariyê û pêdiviyên jiyanî û sereke ji koçberên ku vegeriyane Şengalê re dabîn bikin.

Herwiha di daxuyaniya wezîrê de hate gotin ku vegerîna koçberên Êzidî di çarçoveya plana wezareta wan a li ser bingehê bidawîkirina dosyaya koçberan li Iraqê li gel bernameya hikûmetê û bi hevahengiya hêzên ewlekariyê û hikûmetên xwecihî û wiha hate gotin; “Em weke wezaret li xebatên xwe yên tomarkirina koçberên ku dixwazin vegerin ser cih û warên xwe dewam dikin.”

# Helwesta gel dikare dagirkeriyê rawestîne

**Fermandariya YRK’ê bi daxuyaniyekê ragihand ku êrişên artêşa Tirk a dagirker ên bi rêya balafirên bê mirov ên ser herêmên Asos û Pêncwên dijwartir bûne û got; “Tenê helwesta gelê me dikare dagirkeran bişkîne û rawestîne.”**



Fermandariya Yekîneyên Rojhilatê Kurdistanê (YRK) derbarê êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li ser herêma Asos û Pêncwênê de daxuyaniyek weşand.

Fermandariyê di daxuyaniyê de diyar kir ku êrişên dewleta Tirk a dagirker ên bi balafirên bê mirov ên li ser herêmên Asos û Pêncwênê dijwartir bûne. Di daxuyaniyê de hate gotin ku ji ber êrişan ziyanek mezin digihê bax û baxçeyên xelkê herêmê.

Fermandariya YRK’ê di dewama daxuyaniya xwe de bang li hemû kesan kir ku dijî êrişan nerazîbûna xwe bidin nîşandan û hate gotin; “Ji ber ku wê tenê helwest û dijberiya gelê me, taybet jî Herêma Kurdistanê, dikare dagirkeriyê bişkîne û rawestîne. Em van êrişên dewleta Tirk a bi tundî şermezar dikin. Armanca êrişên dewleta Tirk, dewamkirina şerê berfireh ê li dijî hemû gelê Kurd e.”

YRK’ê di dawiyê de jî ragihand ku wê teqez têkoşîna gel û hêzên tevgera azadîxwaz ya gelê Kurd, dijî dagirkeriyê biserkeve.

# 'Çareserî tenê bi danûstendinên Sûrî –Sûrî pêkan e'

Hevseroka MSD'ê Emîna Umer diyar kir ku çareseriya kirîza Sûriyê tenê bi diyalog û çareseriya siyasî pêkane û got, hikumeta Şamê bêhelwest û bêbiryare, yên ku wê bi rêve dibin jî Rûsiya û Îranê ye.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Kirîza Sûriyê wê derbasî sala xwe ya 13'emîn bibe û hîna niha siberojeke nediyar li benda gelên Sûriyê ye. Sedem jî hêzên desthiladar û mêtinger yên weke Rûsiya, Îran, dagirkeriya Tirkî û hikumeta Şamê ku ji bo desthlatdariyê gel dikin qurabn. Van hêzan bi 10'an civîn ji bo kirîza Sûriyê lidar xistine , lê herdem civînên wan bê encam mane.
Li aliyekî din, ji destpêka damezrandina Rêveberiya Xweser û heta niha, ew ji bo berjewendiyên gelên herêmê kar û xebatê dike, bi 10'ê caran banga danûstendinê Sûrî-Sûrî dike û herdem tekez dike ku çareseriya kirîza Sûriyê tenê bi diyalogê pêkane. Herî dawi di 18'ê Nîsanê de, Rêveberiya Xweser ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê beyannameke ku ji 8 xalên sereke pêk tê, eşkere kir. Lê hemberî wê hikumeta Şamê tu helwset nîşan neda û bê deng ma, herwiha li hemberî êrîşên dagirkeriya Tirk yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê jî , xwe bêdeng dike.
Derbarê rewş û geşedanên siyasî yên li Sûriyê hevseroka Meclisa Sûriye Demokrat MSD,ê Emîna Umer ji rojnameya me re axivî.



**'Erdheja 6'ê Sibatê guhertineke bingehîn bi xwe re anî'**

Emîna Umer diyar ku piştî erdhej çêbû poltîka û helwestên hêzên navdewletî di derbarê Sûriyê de hatin guhertin û wiha axivî: "Ji destpêka ku aloziya Sûriyê rûdaye, hikumeta Sûriyê di bin zext û fişarekê de ye. Lê dema ku erdhej li Tirkî, Bakurê Kuridistan û Sûriyê çêbû rewşa siyasî ya Sûriyê hate guhertin. Hêzên navdewletî helwesta xwe ji ber vê rewşa mirovî û exlaqî di derheqê gelên Sûriyê û hikumeta Şamê de guherand. Yek ji van dewletan jî DYE û gelek dewletên erebî bû. Van dewletan destek dan gelên Sûriyê. Di heman demê de dewletên ereban ji bo bidawîkirina pirsgirêkên Sûriyê, Sûriye vegerandin Komkara Erebî û gelek civîn bi hikumeta Şamê re li dar xistin. Piştî van derfetan jî hikumeta Şamê nedikarîbû çareseriyekê ji bo kirîza Sûriyê bibîne, hikumeta Şamê sûd ji van derfetên zêrîn negirt. Herwiha siyaseta xwe ya şaş neguherand, têkiliyên wê bi derdorê re rawestiyan û kirîz jî her ku çû xerabtir bû. "

**'Hikumeta Sûriyê bêhelwest û bêbiriayr e'**

Emîna Umer da zanîn ku hikumeta Şamê ji bo rewşa siyasî ya Sûriyê bêhelwest û bêbiryar e û wiha got: "Em tev dizanin ku Îran û Rûsya ku piştgiriya hikumeta Şamê dikin, Sûriyê bi rê ve dibin. Van herdû dewletan jî hiştine ku hikumeta Şamê heta niha li ser piyê xwe bimîne. Li aliyekî din jî têkilî û berjewendiyê dewleta Îran û Rûsya bi dagirkeriya Tirkî ya ku hikumeta Şamê wê weke dijmina xwe dihesbîne, eşkere ne. Lewma em dibînin ku hevkarên hikumeta Şamê nahêlin ev hikumet li dijî dagirkeriyê derkeve. Herwiha li hember dagirkeriya Tirkî bibe kelemek. Me di vê dema dawî de dît ku hikumeta Şamê li gor axaftinên ku dan, diyar bû ku vê hikumetê heya astekê gotinên xwe di derbarê dagirkeriyê de guherandine. Lê ev helwest bi tena xwe têrî vê dagirkeriyê nake, divê hertim nerazîbûna xwe jê re destnîşan bike. Di heman demê jî divê hikumeta Şamê li hember dagirkeriya Tirkî xwedî biryarên piratîkî be. "


**'Çareseriya siyasî û diyalog riya herî guncaw e'**

Hevseroka MSD'ê Emîna Umer tekez kir ku çareseriya kirîza Sûriyê bi riya çareseriya siyasî û diyalogê ye û wiha axaftina xwe bi dawî kir: "12 sal li ser kirîza Sûriyê derbas bûn, ev gel jî gelekî westiyan. Çarsereriya ku hikumeta Şamê dixwaze pêk were, bi riya hêzên navdewletî yên weke Îran û Rûsiyê ye. Lê îro jî berê van gelan li mirinê ye û hikumeta Şamê jî tiştekî nake. Berovajî vê yekê têkiliyên xwe bi dagirkeriya Tirkliyê re çêdike û li ser maseya nîqaşê biryaran li dijî Rêveberiya Xweser distînin. Em weke MSD'ê tekez dikin ku siyaseta hikumeta Şamê li ser dimeşe şaş e û kirîza Sûriyê çareser nake."

# Ji MSD'ê destek ji bona çalakiyên gel

**MSD`ê diyar kir ku ew destekê didin çalakiyên gel ên li bajarên Sûriyeyê û di heman demê de bang li welatiyan kir ku nekevin xefikên desthilat û saziyên ewlehiyê, ên dewleta Tirk û çeteyan.**

Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) têkildarî rûdanên dawîn ên li bajarên Sûriyeyê daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "MSD bi baldarî pêşdeçûnên meydanî yên li bajarên Sûriyeyê û hêrsa civaka Sûriyeyê ya ji ber rewşa debarê, aborî û tunebûna îstîqrarê dişopîne. Civaka Sûriyeyê êşên şerê welat parçe kir û zêdetirî nîvê gel koçber kir, dikişîne. Lê desthilatdarên li Şamê li hember vê rewşa xeternak aciz in û tu çare nedîtin. Ew yek di demekê de ku xizanî, gendelî û krîza debarê belav bûye, pêk tê.
MSD piştgiriyê dide tevahî xwepêşandanên li bajarên Sûriyeyê yên ku welatî hêrs û redkirinên xwe li dijî siyasetên desthilata li Şamê nîşan didin. MSD çewisandina xwepêşandan û bikaranîna tundiyê li dijî welatiyan şermezar dike û bang li desthilatên Şûriyeyê kir ku bendên biryarên navneteweyî yên ku rêzê ji mafên xwepêşandanên aştiyane re digirin, girtî werin berdan, pêk bînin û dest bi qonaxeke aşkera ku girîngiya wê bidawîkirina şerê li Sûriyeyê bike; tê de pergala demokrasiyê tê avakirin û edalet ji tevan re pêk tîne. Em guleavêtina li dijî xwepêşandêran bi tundî şermezar dikin û piştgiriya xwe ji tevgera aştiyane re nîşan didin. Kesên tevgerên aştiyane li Heleb, bajarên berava Sûriyeyê, Siwêda û Dera li dar dixin, nekevin xefka nakokiyên desthilat û saziyên wê yên ewlehiyê çêdikin, her wiha nekevin xefka planên dewleta Tirk û alavên wê yên îxwanî. Da ku mîna berê ev tevger nebin sedema êşên sûriyeyiyan.
Em tekezî li ser girîngiya çareseriya siyasî ji bo giranbûna rewşa Sûriyeyê dike, her wiha kiryarên tundî, wêrankirina mozaîka civaka Sûriyeyê, binpêkirina mafên mirovan li herêmên di bin serweriya desthilata Şamê û herêmên dewleta Tirk dagir kirine de, şermezar dikin. Ev xwepêşandanên aştiyane rêya rast a ber bi armanca guhartinê û demokrasiyê ve ne.
Têkildarî aliyên herêmî ji doza Sûriyeyê re, pêdiviya xwezaya krîzê bi helwesteke sûriyeyî û zanabûneke neteweyî li ser barên qonaxê û rihên pirsgirêkên ku rejîma navendî çêkiriye, heye. Her wiha pêdiviya wê jî bi xebateke hevbeş a bidawîkirina şer û zêdekirina krîza mirovî heye. Em careke din piştgiriyê didin xwepêşandan û xwestekên xwepêşandêran û bang li tevahî sûriyeyiyan dikin piştgiriyê bidin."



## H.Fidan, çima çû Bexda û Erbîlê?

**Ahmet Aktaş**

Wezîrê Karê Derve yê Tirkiyeyê Hakan Fidan, vê hefteyê li Iraqê bû. Weke serokdewletekî hat pêşewazîkirin!
Roja yekê, li Bexdayê bû. Hema hema bi hemû rêvebirên dewletê re civîn çêkir. Ji Serokdewlet Abdulletif Reşît, Serokwezîr Ş.Sûdanî, Serokê Meclisê M.Helbûsî heta Wezîrê Karê Derve F.Husên û Wezîrê Bergirî M.Ebasî û hwd.
Ne tenê bi rêveberên dewletê re, belê li gel piraniya rêveberên opozisyonê re jî hevdîtin pêkanî: Mîna Nûrî Malikî yê Serokwezîrê kevn, Omer Hekîm, Hemis Xençer, Hadî Emîrî û hwd.
Roja duda, li Erbîlê bû. Bêgûman pêşî ji serokên xiyanetê Malbata Berzanî despê kir; bi rêzê li gel Mesûd, Mesrûr û Nêçîr rûnişt. Pişt re jî berê xwe da hevalbendê xwe yê bingehîn Serokatiya Eniya Tirkmenê Kerkûkê.
Bi vê mijara Tirkmenan ve girêdayî, divê hinek bahsa civîn û hevdîtinên Fidan, ên bi serokên Tirkmenan ra yên li Bexdayê were kirin.
Ev civîna balkêş li Balyozxana mezin a Tirkiyeyê ya li Bexdayê pêkhat.
Li vira hediyekê/yadîgarekê didin Fîdan. Dibêjin; "ev Xencera Osmaniya ya ku 120 sal e li vira ye û em didin te(bibe li Kurda bide), da ku tu vêya bigihêne Welatê Wê yê dayîkê/bavê"!
Bi vê gotinê re, gelo peyamek wisa nayê bîra mirovan? "Jixwe ji berê ve ev xaka di bin serweriya Osmaniya(Tirkan) de bû, her nuha jî divê dîsa bikeve bin nîrê dewleta Tirka ya bermaya Osmaniya(wateya wê gotina Welatê Dayik û Bav ev e)"!
Jixwe bi vê peyamê re, armanca gera berfireh û demdirêj a Hakan Fidan jî hinek zelaltir dibe. Ma dewleta tirka jixwe ev nebû demek dirêj e ku di nava dakirkirına Başûr de ye? Ma her roj êrîşên bejayî û hewayî, aşkere û nehînî najo ser gelê me yê Başûr?
Bi taybetî di van rojên gera Fidan de êrîş zêdetir bûne; li gel Başûr û Bakur li Rojava jî ev êriş bê navber didomin.
Bê gûman ev êrîşên dagirkerî û qirkerî, ne bêyî destûra şef û fermandarên Fidan û Receb in!
Heta daxwazên hîn zêdetir jî hene, di projeya ku dane destê vê koma rêveberiya Receb a tezekirî de; lêdana Îranê û bi vêna ve girêdayî, rêgirtina pêşveçûna eniya Çîn û Rusyayê!
Jixwe durûtiya Rûsya û DYEyê ya li gel Şoreşa Rojava û bi giştî li gel Tevgera Azadiya Gelê Kurdistanê jî, êdî mirova pir aciz û hêrs dike.
Li milekî, xwe alîgirên gelê Kurdistanê nîşan didin, li milê din jî, rê û destûrê(heta mirov dikare bêje fermanê) didin dewleta faşîst a tirk ku agir li Kurdistanê bi barîne.
Eha nuha jî Wezîrê kevn ê DYEyê, li Rojava ye û xwedêgiravî pesnê hevalbendiya xwe û QSDê dide.
Di heman demê de, çawa dibe ku hûn him dostên gelê Kurdistanê bin û him rê bidin êrîşên qirkirina dewleta tirk?
Her wiha di heman demê de Fidanê we jî li Iraqê, li ser plan û projeyên qirkirin û dagirkirina Kurdistanê dixebite! Tê gotin ku berpirsê ENKSê jî vexwendiye cem xwe Erbîlê.
Ji alîkî ve, ev durûtiya we, dide diyarkirin ku qasî gelê Kurdistanê hewcedarê we ye, hûn pirtir hewcedarê gelê Kurdistanê ne.



# PDK'ê ji dijmin re bûye amûra qirkirina gelê Kurd

PDK'ê û ENKS'ê ji bo rewakirina dagirkiriya li Efrînê çi ji destê wan tê ji dagirkeriyê re dikin û ji bo qirkirina gelê kurd ji dijmin re bûne amûr. Berpirsê Ofîsa Têkiliyan ya Meclisa Sûriye Demokratîk Mihemed Hesen diyar kir ku PDK'ê bi riya Saziyên xwe yên li Efrînê li dijî gelê kurd hevkariya dagirkeriyê dike.

**Esma Mistefa/ Şehba**

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê, ji bo pişaftina gelê resen yên ku li Efrînê man e, guhrtina demografî û ya ziman, çand û nasnameyê dimeşîne. Li ser xaka Efrînê hemû binpêkirinên dij mirovî tên pêk anîn. Armanca dagirkeriya Tirk pêkanîna guhartina demografî û etnîkî di giştî herêmê de ye, ev yek jî bi riya avakirina malên mêtîngeriyê û bicihkirina gelên Ereb û Turkmen pêk tîne. Bê guman li ser gelê resen yên ku ji mecbûrî di Efrînê de mane hemû cureyên qirkirinê dide meşandin û gel ji mefê xwe pê par maye. Biştî Erdheja 6'ê Sibatê Saziya Xêrxwaziya Berzanî derbasî Efrînê bûn û qaşo wê alîkariya gelê Kurd bikin. Lê belê di bin navê alîkariyê de saziyên xwe di hundir Efrînê de daye vekirin û bi dagirkerî û çeteyên girêdayî wê re bûye alîgir, herwiha siyaseta hevkariya dagirkeriyê dide meşandin. Weke ku di Efrînê de dagirkerî tune ye û banga gelê koçber dikin ku vegerin Efrînê. Têkildarî îxaneta PDK'ê li hember gelê Kurd di Efrînê de û hevkariya wê bi dagirkeriyê re, Berpirsê Ofîsa Têkiliyan ya Meclisa Sûriye Demokrat Mihemed Hesen ji rojnameya me re axivî.



**'Dagirkeran warê azadî û aşîtiyê kirin dojeh'**

Mihemed anî ziman ku Efrîn beriya dagirkirinê ji herêmên derdor re bibû cihê herî ewle û ya xebatê, bi dagirkirnê re rengê azadî û aşîtiyê veguherî dujehê û wiha domand: "Bajarê Efrînê bi avakirina sîstema Netewa Demokratîk re bû warê azadî, aşîtiyê, pêşesazî û ya herî bi ewle. Êdî hemwelatiyên herêmên derdor berê xwe didan Efrînê û tê de bi cih bûn. Efrîn hemû pêkhate û netew di nava xwe de hembêz kir û bi rengê Netewa Dempkratîk pêkhatiyan bi azadî jiyan dikirin. Lê belê Efrîna pîroz bû armanca dagirkeran û di 18'ê Adara 2018'an de ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê ve hat dagirkirin. Bi dagirkirinê re tavahî binpêkirinên derveyî exlaqê mirovî tên kirin. Rojane qetilkirin, revandin, destdirêjî li ser gelê resen tê kirin. Êdî ew warê azadî û aşîtiyê veguherî dujeha dagirkeran".

**'PDK ê li ser hişmendiya Osmaniyan hatiye mezinkirin'**

Mihemed Hesen destnîşan kir ku PDK'ê bi hişmendiya Osmaniyan hatiye mezinkirin û wiha got: "Di dîroka siyaseta Osmaniyan de polîtîkeya girêdanbûna hin Kurdan bi hişmendiya xwe ve dihate meşandin û ku ew kurd weke dûvikên Osmaniyan bên mezinkirin, da ku di pêşerojê de li çar perçeyên Kurdistanê êrîşî Kurdan bi Kurdan bê kirin. PDK'ê û ENKS'ê ew Kurdên ku bi hişmendiya Osmaniyan hatine mezinkirin. Bi avakirina saziyên xwe di hundir herêmeke Kurdî ku hatiye dagirkirin de, tê wateya îxanet û dijminahiyê. PDK'ê yekser bi dagirkeriya Tikiyê û çeteyan re hevkariya dakirkeriyê dike da ku ew jî bibe hêzeke sereke di Efrînê de. Lê belê tenê weke leystûkekê di destê Tirkiyê de tê bikaranîn".

**'PDK ê di Efrînê de siyaseta rewakirina dagirkeriyê dimeşîne'**



Mihemed Hesen diyar kir ku PDK'ê li Efrînê siyaseta vegerandina gelê koçber dide meşandin û rawakirina dagirkeriyê armanc dike û wiha domand: "Di hundir Efrênê de siyaseteke qirêj ya piropagandayê ji aliyê Tirkiyê û PDK'ê ve tê birêve birin. PDK'ê siyasta dagirkeriya Tirk dimeşîne û dixwaze bide xuyakirin ku di hundir Efrînê de zext, revandin, kuştin, binçavkirin û talan kirin nîne û jiyan bi awayekî xwezayî tê birêvebirin. Bi vî awayî piropagandaya teşwîqkirina vegerandina gel dide meşandin. Yek ji armanca jî valakirina herêma Şehbayê ye û bi wê riyê dikarin ji raya giştî re ragihînin ku gel bi hebûna Tirkan raziye û dagirkirina efrînê rewa bikin."

**'Xiyaneta PDK'ê tevahiya sînor derbas kirin'**

Berpirsê Ofîsa Têkiliyan ya MSD'ê Mihemed Hesen tekez kir ku PDK'ê xeta îxanetê derbas kiriye û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Rêxistinên navneteweyî deerbarê kiryarên komên çete yê li Efrînê daxuyanî dan û diyar kirin ku li Efrîn li dijî gel gelek sûc tên kirin, lê PDK'ê li hemberî vê yekê derket û piştgiriya faşîzma Tirkiyê û komên çeteyan kir. Bi vê yekê hat zelalkirin ku PDK'ê êdî xeta îxanetê derbas kiriye û weke dijminekî hevpar bi Tirkiyê re li hember Tevgera Azadiyê tê dîtin."

# Hevkariya PDK'ê û dagirkeriya tirk

**KCK'ê diyar kir ku dewleta Tirk dixwaze dagirkeriya xwe ya li xaka Iraqê bide qebûlkirin û diyar kir ku "Dewleta Tirk a dagirker û mêtinger bi piştgiriya PDK'ê bi israr hewl dide tevgera me û dewleta Iraqê bîne dijberî hev."**

Komîteya Têkiliyên Derve ya KCK'ê têkildarî serdana wezîrê karên derve yê dewleta Tirk a dagirker Hakan Fîdan a li Bexda û Hewlêrê daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin "Wezîrê Karên Derve yê Tirk Hakan Fîdan piştî hevdîtina li Bexdayê ya bi Wezîrê Karên Derve yê Iraqê re daxuyanî da. Serokê berê yê MÎT'ê Hakan Fîdan bal kişand ser berjewendiyên hevpar û serweriya Iraqê û îdîa kir ku PKK'ê xaka Iraqê dagir kiriye, xwest PKK'ê weke 'rêxistineke terorê' nas bikin û ji bo 'têkoşîna hevpar a li dijî terorê' bang kir.
Wezîrê Karên Derve yê dewleta Tirk Hakan Fîdan dixwaze bi kincê Wezareta Karên Derve karên xwe yên qirêj ên dema serokatiya MÎT'ê vê carê di bin navê 'dîplomasiyê' de pêşkêş bike.

**'Dixwaze dagirkeriyê bi dîplomasiyê mayînde bike'**



Wezîrê Karên Derve yê Tirk ku bi dagirkirina xaka Iraqê 100 qereqol, baregehên leşkerî û navendên MÎT'ê ava kiriye, bêyî ku li ber xwe bikeve qala yekparebûna xak û serweriya Iraqê dike. Hakan Fîdan li gorî xwe dixwaze ku dagirkeriya leşkerî ya Tirkiyeyê ya li nava xaka Iraqê bi Iraqê bide qebûlkirin û asayî bike.
Tirkiye ku Hewlêr ji aliyê siyasî, leşkerî û aborî ve kiriye mîna wîlayeteke Tirkiyeyê, bêdengiya Hikumeta Başûrê Kurdistanê, dewleta Iraqê û Neteweyên Yekbûyî ji xwe re weke firsendekê dibîne, dixwaze vê polîtîkaya xwe belav bike û dagirkeriya xwe ya li Kurdistanê û xaka Iraqê bi rêya 'dîplomasiyê' mayinde bike.
Hakan Fîdan ku bi komplogerî û provokatoriyê tê naskirin û ji bo dagirkirina xaka Sûriyeyê gotibû, 'eger pêwîst bike ez ê çend rokêtan ji aliyê Sûriyeyê ber bi Tirkiyeyê ve bidim avêtin', niha jî bi navê Tirkiyeyê karê 'dîplomasiyê' dike.
Hakan Fîdan ku bajarên Başurê Kurdistanê bi ajanên MÎT'ê û çeteyên kujer dagirtiye û bi fermanan li Silêmaniyê, Şengal û Mexmûrê bi dehan mirov qetil kir, bêyî ji xwe fedî bike qala têkoşîna hevpar a li dijî 'terorê' dike.
Musteşarê berê yê MÎT'ê û Wezîrê Karên Derve yê nû yê Tirkiyeyê daxuyaniyên xwe yên derewîn û vale bi gotina 'Tirkiye li dijî DAIŞ'ê têkoşîneke mezin dimeşîne' dewam dike û jê heye ku wê bi vê derewa xwe karibe cîhanê bixapîne.
Di 10'ê Hezîrana 2014'an de dema ku DAIŞ'ê avêt ser Konsolosxaneya Tirkiyeyê ya li Mûsilê, Serkonsolos Ozturk Yilmaz û tîmên taybet ên konsolosxane diparastin bêyî ku fîşekeke bi tenê jî biteqînin teslîm bûn. Wê demê Hakan Fîdan serokê MÎT'ê bû. Yê ku ji Serkonsolos û tîmên taybet got 'Zorê nedin DAIŞ'ê, em di dewrê de ne' ev kes bû. Ji xwe çeteyên DAIŞ'ê ku di nava 10 deqeyan de konsolosxane bi dest xistin, heman piştî serdegirtinê daxuyanî dabû û gotibû, 'Em amadene bi rayedarên Tirk re hevdîtinê bikin'. Têkiliyên Tirkiyeyê yên bi DAIŞ'ê re ku bi vê bûyerê re destpê kir, niha jî bi rêya Hakan Fîdan û MÎT'ê bi rengekî eşkere dewam dike. Petrola Iraqê ya ku tê dizîn û li ser Tirkiyeyê pêşkêşî bazarê tê kirin, karekî hevkariya dewleta Tirk û DAIŞ'ê ye. Di vê mijarê de gelek belge, dîmen li nava raya giştî hate weşandin.
Dema ku Hakan Fîdan Serokê MÎT'ê bû, bi hevkariya dewleta Tirk û DAIŞ'ê bi dehan komkujî û êrîşên bombeyî hatin kirin, kiryarên rastî yên van êrîşan ti carî nehatin girtin.
Armanca esasî ya Hakan Fîdan a ji serdanên Bexda û Hewlêrê ku bi navê Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê kir, ew bû ku dagirkeriya Tirkiyeyê ya li ser xaka Iraqê neke mijara nîqaşê, li şûna vê jî polîtîkayeke welê bimeşîne ku Başûrê Kurdistanê bike eyaleteke Tirkiyeyê. Li gel vê yekê xwest ku polîtîkayên sûîqest û êrişê yên li ser Silêmaniyê, Şengal û Mexmûrê dewam bike.
Tu pirsgirêka tevgera me bi dewleta Iraqê û gelên wê re tune ye. Her tim peywendiyên me yên dostane li gel Iraqê hebûn, ji ber ku ew yekane dewleta herêmî ye ku dikare ji pirsgirêka Kurd re çareseriyê pêş bixe û hebûn û azadiya Kurdan bixe bin ewlehiyê. Dewleta Tirk a dagirker dixwaze dewleta Iraqê jî tevlî siyaseta xwe ya qirkirina Kurdan a li ser esasê înkar û îmhayê bike. Ji ber wê jî kujerê Kurdan Fîdan dibêje, 'divê Iraq PKK'ê rêxistina terorê îlan bike'. Rewşek ecêb e ku vê yekê li hemberî rûyê Wezîrê Derve yê Iraqê ku Kurd e, dibêje û rastî ti bertekê nayê. Dewleta Tirk a dagirker û mêtinger bi piştgiriya PDK'ê bi israr hewl dide ku tevgera me û dewleta Iraqê bînin dijberî hev. Em dizanin ku berpirsên dewlet û hikûmeta Iraqê, rewşenbîr û gelên welatparêz wê nekeve nava vê leystokê û li hember wê rawestin.

**'Divê destûr neyê dayîn ku Iraq û başûrê Kurdistanê bibin qada MÎT û DAIŞ'ê'**

Bi vê wesîleyê di serî de gelê Kurdistanê û Iraqî, divê rêveberiya Başûrê Kurdistanê, rêveberiya Bexda û teşkîlata NY'ê dawî li dagirkeriya Tirkiyeyê ya li ser xaka Iraqê bînin û ji bo rakirina hemû baragehên leşkerî bikevin nava hewldanan. Divê mirov êrişên hewayî û bejahî yên bi hinceta 'terorê' li ser xaka Iraqê tên kirin, neke hinceta dagirkeriya Tirk û xwezayî nîşan bide; divê destûr neyê dayîn ku dewleta Tirk di bin navê têkîliyên siyasî û bazirganiyê de Kerkûk, Mûsil, Hewlêr û Silêmaniyê bike paşbaxçeyê çeteyên DAIŞ'ê û MÎT'ê. Şertê destpêkê û diyarker ê xak û serweriya Iraqê, dawî li dagirkeriya Tirk a li ser xaka Iraqê anîne."